# TENÊ NA BE

HDP

## NA! JI DÎKTATORIYÊ RE!

**Ev makeqanûn dîktatorî ye**
Kesek meclisê betal dike, hemû erkan digire destê xwe. Biryara şer dide. Dest datîne ser mal û milkê xelkê. Hemû saziyên dewletê dixe bin kontrola xwe. Tu hêz nikare wî kontrol bike û bidarizîne.
Qebûl NA be!

## NA! JI FAŞÎZMÊ RE!

**Ev makeqanûn tifaqa faşîzmê ye**
Ev tifaqa nijadperestiya AKP û MHP'ê ye. Zîhniyeta wan 'Yek ziman, yek al, yek netew û yek welat' e. Hebûna kurdan, gelan û baweriyên cuda nas nakin.
Qebûl NA be!

## NA! JI DESTESERKIRINA ÎRADEYÊ RE!

**Ev makeqanûn qirkirina siyasî ye**
Girtina Selahattîn Demîrtaş, Fîgen Yuksekdag û parlementerên HDP'ê ye. Desteserkirina şaredariyan, girtina hevşaredaran û endam û rêveberên partiyên kurdan e.
Qebûl NA be!

## NA! JI ÎNKARÊ RE

**Ev makeqanûn înkar e**
Qedexekirina zimanê kurdî ye. Girtina Azadiya Welat, Enstîtuya Kurdî, Navenda Çanda Mezopotamya û saziyên Kurdistanî ye.
Ji bîr NA be!

## NA! JI ÎMHAYÊ RE!

**Ev makeqanûna tunekirinê ye**
Wêrankirina Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Gever, Hezex, Şirnex û Farqînê ye. Bombebarankirina goristanan û êrîşa li ser Başûr û Rojava ye.
Qebûl NA be!

## NA! JI QIRKIRINA XWEZAYÊ RE!

**Ev makeqanûn komkujiya xwezayê ye**
Xeniqandina Heskîfê, kambaxkirina Munzurê, şewitandina daristanan, çêkirina HES û kalekolan e.
Ji bîr NA be!
Qebûl NA be!

## NA! JI QIRKIRINA JIN Û ZAROKAN RE!

**Ev makeqanûn cînsiyetparêz e**
Nenaskirina îradeya jinê ye û dijberiya pergala hevserokatiyê ye. Teşhîrkirina bedena jinên kurd e. Bê exlaqî û îstismarkirina bedenên zarokan e.
Ji bîr NA be!

## NA! JI PARASTINA SÛCDARAN RE!

**Ev makeqanûn sûcdaran diparêze**
Kujerên Ceylan Onkol, Ugur Kaymaz, Dayika Taybet, Mîraya 3 mehî û û Cemîleya 7 salî bê ceza man. Sûcdarên Roboskî û Cizîrê nayên mehkemekirin. Hesab ji wêrankerên bajarên kurdan nayê pirsîn.
Ji bîr NA be!

# TENÊ NA BE

**NA** xwedîderketina li demokrasî pir-rengî û pirdengiyê ye

**NA** xwedîderketina li Rojava û Şengalê ye

**NA** xwedîderketina li Munzur Terolar û Heskîfê ye

**NA** redkirina tecrîdê û guhdarkirina dengê aştiyê ye

**NA** berxwedana girtiyên azadiyê ye

**NA** bersiva hawara Cizîrê ye

**NA** banga yekîtiya neteweyî ye

**NA** redkirina dagirkeriya qeyûm e

**NA** strana azadiyê ye



# TENÊ NA BE

HDP

Hayır
Tercih

HDPgenelmerkezi www.hdp.org.tr